

**Em bi hev re aparteîdê  
boykot bikin?**



**Tevlî kampanyaya Devera Bê-  
Aparteîd bibin!**



**SUMUD**  
THE FINNISH PALESTINE NETWORK  
صُمُود - شبكة فلسطين الفنلندية



**BDS**  
FINLAND

## Werin em li Fînlandayê Devera Bê-Aparteîd ava bikin!

Niha hûn, şîrket, sazî, çalakî û civata we dikarin bi awayekî çalak piştgirîya têkoşîna gelê Filistînê ya ji bo mafên mirovan û azadîyê bikin. Kampanyaya Devera Bê-Aparteîd nas bikin û beşdarî kampanyaya me bibin!

Li Fînlandiya kampanya ji aliyê Sumud – Tora Filistînê ya Fînlandî – ve tê organîzekirin.

### Devera Bê-Aparteîd çi ye?

Devera Bê-Aparteîd (AFZ – Apartheid-Free Zone) ji bo piştgirî û alîkarîya têkoşîna gelê Filistînî ya ji bo mafên mirovan û azadîyê, qadeke çalak e.

Devera Bê-Aparteîd ji raya giştî re beşdarbûna xwe ya vê kampanyayê radigihîne û bi awayekî çalak, li rêyên rakirina têkiliyên sazîyên ku piştgirîya rejîma aparteîd a Îsraîlê dikin, digere. AFZ boykotên akademîk û çandî jî tê de, beşdarî boykotên tevgera BDS dibe û heya ku Îsraîl li gorî hiqûqa navnetewî û prensîbên mafên mirovan tevbigere, boykota xwe didomîne. AFZ li dijî nijadperestiyê ye û wekhevîyê diparêze, û rexnekirina dewleta Îsraîlê bi têkelkirina antîsemîtîzmê re red dike.

Kesên ku serdana Devera Bê-Aparteîd dikin, dikarin bi wîjdaneke rehet demê xwe derbas bikin, ji berku ew dizanin ku ew cîhên ku lê ne, bi awayekî çalak li dijî rejîma aparteîd a Îsraîlê û komkujîya Filistînê ye.

Dikan, kafe, pirtûkxane, zanîngeh, mûze, pêşangeha hunerê, qada konserê, qada civakî û qada giştî dikarin xwe wekî Devera Bê-Aparteîd pênase bikin û ragihînin.

Devera Bê-Aparteîd kampanyayeke navnetewî ya BDS e û armanc ji wê kampanyayê tevlikirina sazî û civakên cûda ji bo piştgirîya boykotên tevgera BDS ya Filistînê ye. Li Ewropayê, bi sedan cihan xwe wekî Devera Bê-Aparteîd ragihandine.

## Şîrket yan jî cîhê me çawa dikare bibe Devereke Bê-Aparteîd?

Her şîrket û cîh dikare bibe Devereke Bê-Aparteîd. Devereke Bê-Aparteîd wan xalan qebl dike:

- 1) prensîbên tevgera navnetewî ya BDS û boykotên diyarkirî, herwiha bersiva bangên nû yên BDS ji bo boykotên nû di pêşerojê de.
- 2) boykotên akademîk û çandî ji aliyê tevgera BDS (PACBI)
- 3) têkoşîna li dijî nijadperestîyê

Herwiha divê Devereke Bê-Aparteîd:

- 4) ji raya giştî re xwe wekî Devereke Bê-Aparteîd îlan dike
- 5) li qadên xwe bi rêya afîşekê nîşan bide ku ew der Devereke Bê-Aparteîd e
- 4) di lîsteya Deverên Bê-Aparteîd a malpera sumud.fi de were zêdekirin (navê cîh û bajar)
- 5) di lîsteya navnetewî ya malpera [www.bds-movement.net](http://www.bds-movement.net) de were zêdekirin (navê cîh û bajar)

Ger hûn dixwazin beşdar bin, tîma me a kampanya dikare alîkarîya we bike! Herwiha hun dikarin bi rêya emailê mere bikevin têkiliyê: [bds@sumud.fi](mailto:bds@sumud.fi)

## Ger em xeletiyek bikin, wê çi dibe?

Her kes dikare xeletiyên bike. Ger we bêhemdî tiştêkî ji lîsteya boykotê stand yan jî firot yan jî bi awayekî alîkarîya rejîma aparteîd a Îsraîlê kir, tiştê herî girîng sererastkirina xeletiyê ye. Armanca kampanya ewe ku firsendê bide her deverê ku dixwazin kar û çalakiyên xwe exlaqîtir bikin û bi vî rengî piştgirî bidin tekoşîna Filistinê ya ji bo mafên mirovan. Çêtir e ku beşdarî kampanyayê bibin û xeletiyek bikin, şûna ku qet piştgirî nedin kampanyayê.

Dema pêwîst be, hûn her tim dikarin ji tîma kampanyayê alîkarîyê bixwazin.

## Devereke Bê-Aparteîd divê çî boykot bike?

Devera Bê-Aparteîd şîrket, berhem û markeyên ku ji hêla tevgera BDS ve hatin diyarkirin, boykot dike. Cîhên ku ji bo boykotê tîn hedef girtin bi demê re tîn guhertin, dema li hinek cîhan boykot digihîje amanca xwe, hinek cîhên din yê nû tîn zêdekirin. Hûn ê bi nûçenameya me re li ser van guhertinan werin agahdar kirin. Li jêr lîsteya cîhên ku aniha ji hêla BDS ve tîn boykot kirin hene:

Deverên Bê-Aparteîd divê wan şîrket û berheman boykot bike:

- Berhem, sebze û fêkiyên ji Îsraîlê an jî ji deverên ku Îsraîl neqanûnî bicîh buye
- AXA
- Carrefour
- Chevron, herwiha markeyên Caltex û Texaco, û Noble Energy ku xwediyê wê Chevron e
- Dell
- Disney+
- Hewlett Packard Inc (HP Inc)
- Intel
- RE/MAX
- Siemens
- SodaStream
- The Coca-Cola Company
- McDonald's, Burger King, Papa John's, Pizza Hut
- WIX
- Wolt
- Barclays
- CAF
- Cisco
- Elbit Systems
- HD Hyundai/Volvo/CAT/JCB
- HikVision
- TKH Security

Ger alternatîvên wan hene, divê Deverên Bê-Aparteîd wan şîrketan jî boykot bike. Deverên Bê-Aparteîd piştgirî dide kampanyayên zexta tevgera BDS li dijî van şîrketan:

- Airbnb/Booking.com/Expedia
- Google û Amazon (DYA)
- Teva Pharmaceutical Industries

## Gelek şîrketên din jî bi awayên cûda piştgirîya rejîma aparteîd a Îsraîlê dikin. Ma AFZ wan jî boykot nake?

Stratejiya tevgera BDS ew e ku boykot, zext û cezayên li ser şîrket û berhemên taybetî bike armanc da ku bandora herî mezin hebe. Deverên Bê-Aparteîd piştgirîya wan kampanyayan dike. Hûn dikarin di vê malperê de, li ser bandora boykotên diyarkirî zêdetir bixwînin: <https://www.bdsmovement.net/>

Em Deverên Bê-Aparteîd teşwîq dikin ku ew li gorî derfetên xwe, berhem û şîrket ên din ên ku piştgirîya Îsraîlê dikin, boykot bikin.

## Boykota akademîk û çandî çi ye?

Di sala 2004an de, Kampanyaya Filistinî ya ji bo Boykota Akademîk û Çandî ya Îsraîlê li dijî sazîyên akademîk û çandî yê Îsraîlê boykotek ragihand.

Boykota çandî bersivê e li hemberî hewlidayîna sazîyên çandî yê Îsraîlî ji bo domandin û normalîze kirina dagirkerîya Îsraîlê, kolonîzasyona Filistinê û aparteîd. Devera Bê-Aparteîd çalakîyên çandî ku ji aliyê Îsraîlê we an jî sazîyên ku eşkere piştgirîya wan dikin we tîne finansîre kirin, organîze nake. Her wiha, beşdarî çalakîyên ku aparteîd û binpêkirina mafên mirovan normalîze dikin, nabin. Boykot li dijî sazîyên e, ne li dijî kesên Îsraîlî ye.

Armanca boykota akademîk qutkirina tîkiliyan bi zanîngeh û sazîyên din ên akademîk yê Îsraîlî re ye. Zanîngehên Îsraîlî di domandina dagirkeriya neqanûnî û aparteîdê ya Îsraîlê de berpirsyar û beşdarin, herwiha di çêkirina amûrên ku ji hêla artêşê ve û ji bo cudakarîya sîstematîk li dijî gelê Filistinî tîne bikar anîn rolê xwe hene. Deverên Bê-Aparteîd bi sazîyên akademîk ên îsraîlî re hevkarîyê nakin.

Tîma me ya kampanyayê dikarin ji we re li ser boykotên akademîk û çandî zêdetir agahîyê bidin.

Ji bo zanyariyên zêdetir: <https://www.bdsmovement.net/pacbi>

## Tevgera BDS çi ye?

BDS tevgera navnetewî bi pêşengîya Filistinîyane û armanca wê rawestandina alîkarîyên aborî ji bo hikûmeta aparteîd a Îsrailê ye. BDS ji peyvên inglîzî boycott, divestment û sanctions tê, ku wateya wê boykot, vegirtin û cezakirin e. Tevgera BDS li ser prensîbeke bingehîn dixebite: Divê gelê Filistinî jî wekî her kes, xwedî mafên mirovan be. BDS îlhama xwe ji têkoşîna li dijî aparteîdê ya Afrîkaya Başûr û boykotên pê re digire.

Tevgera BDS ya Finlandî beşek ji Tora Filistinê ya Finlandî Sumud e.

Ji bo zanyariyên zêdetir: [www.bdsmovement.net](http://www.bdsmovement.net)

## Aparteîd çi ye?

Aparteîd pergala bi sazî buyî a çewsandin û cudakirina nijadî ye. Navê wê ji polîtakayên aparteîd ên Afrîkaya Başûr di sedsala 20mîn tê (aparteîd di zimanê afrîkanî de tê wateya cudabûnê).

Li gorî Peymana Neteweyên Yekbûyî yê sala 1976an, sûcên aparteîd wekî çalakîyên komeke nijadî yê ji bo afirandin û domkirina serdestîyê li ser komek din tê pênasekirin. Aparteîd, çewsandina sistematîk a li dijî komeke nijadî pêk tîne.

Kiryarên nemirovane bi vî rengî ne:

- Mafê jiyane jê girtin, di nav de kuştin an jî zerareke cidî ya fîzîkî û derûnî bi rêya êşkencekirin, muameleya biçûkxistinê, an jî bisînorkirina azadiyê.
- Girtin û binçavkirina keyfî
- Veguhastina nifûsê
- Koletî/xebata bi darê zorê
- Zilma li dijî komekê
- Windakirinên bi darê zorê
- Astengkirina beşdarbûna jiyana siyasî, civakî, aborî û çandî ya welêt.

Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî (Amnesty International) û rêxistinên din ên mafên mirovan polîtîkayên cudakirine yê Îsrailê wekî aparteîd û sûcên li dijî mirovahîyê pênase dikin. Sûcê aparteîd yek ji sûcên herî giran di asta navnetewî de ye.

**Gelo hûn dixwazîn bêtir zanyarî bigrin? Ji me re binivîsinin [bds@sumud.fi](mailto:bds@sumud.fi).**

**Hûn dikarin li ser Instagram [@boikotoiapartheidia](https://www.instagram.com/boikotoiapartheidia) û Facebookê me bişopînin.**

**Zanyariyên zêdetir li ser kampanyaya: [www.sumud.fi](http://www.sumud.fi)**



**SUMUD**  
THE FINNISH PALESTINE NETWORK  
صُمُود - شبكة فلسطين الفنلندية

